

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Lîbanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên îngilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

# ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telî: Bêrût-Rojanû.

## CENG & SIYASET DEWRAN

### Gotara Serekwezîr

Wezîrê Brîtanî ê yekemîn Mr. Çorçîl, îro gava ket pêşîya civatmiletê Brîtanî, lebatên vî civatê çepilka li hev xistine û bi germî qerê serekwezîr girtine, yê ko piştî çûna xwe Emerîkayê ev cara ewil e ko te pêşîya lebatên Civatmiletî.

Mr. Çorçîl li ser gerê Tûnisê kitkitên jêrîn elam daye: Di gerê Tûnisê de 300,000 eskerên Mihwerê ji qiwet ketine; tê de 248,000 hêşîr û 50,000 kuştî hene; 638 elemana bitenê dikarî bûn xwe ji erdê Tûnisê xelas bikin, piraniya wan bi balafrînan.

Serekwezîr gava qala leşkerên Hevalbenda kiriyê, bi pirsîna heja pesnê wan daye û gotiye:

### Mêraniya Frensîza

Eskerên frensîzî jî bi mîrxasî gerî dijîmana kirine, bi hezaran hêşîrên elemanî û talyanî girtine û bîreka rojên mezin yê Fof û Klemansoyê vejandine. Hemî eskerên Hevalbenda, eskerên frensîzî, amerîkanî û brîtanî qîsma xwe bi nefsa xwe û bi fermandarên xwe anîne. Ji qiwetên brîtanî 35,000 esker jî qiwet ketine, tê de kuştî û brîndarînan hene.

Tu şik nîne ko zeferên Stalîngrad û Tûnisê ji bona elemana du derb û mexlûbiyetine mezin in û di gerên dîrok û tarîxa elemanî de, emsalên wan nîne. Her wekî generalên elemanî bi xwe gotine, şerdarî û serfermandariya elemanî bawer dikirin ko leşkerên Mihwerê heta meha tebaxê wê bikarin di pêşîya Ordîyên Hevalbenda de pê bidin erdê; lê hesabê wan rast derneket.

### Ji Nişka Ve

Ordiya Mihwerê, — eskerên di wê ên çavsor û şerdî yê bi çekine xurt û nûjen bi çek kirî, — di pêşîya derbên me de, ji nişka ve xwe sist kirine û dest ji şerdî kîşandine.

Ev rewîşa wan a rûhî; bi derbekê çavtirsîyandî bûna wan tişteki zehf bi ehemîyet e, divê li vî nîqtê hûr bête meyzandî. Tişteki wîlo piştî gerê Yêneyê û gerê 1914-18 an de jî li Ordîyên elemanî qewimîye. (Şahiya lebatan).

### Emê Zora Wan Bibin

Me xwe kar kiriyê û emê zora dijîminên xwe bibin û wan bişkînin in; û tu car şik ne ketiye dilê me; û me her dizanî bû ko heke em bi serê xwe jî bimana me ew bişkînanda. Di dema aşîyê de hin mîletan — em jî ji wan in — xwe ji bona şerdî kar ne kiri bûn, Lê îro çavê cihanê dibîne ko ew mîletên he bi hilgirtîna barê vî şerdî qels ne ketine, xwe sist ne kirine; berêkî xurt bûne û bi ciwanî û meşîrî vî barî hilgirtin.

## PANTELARIYA KETIYE HEVALBEND PÊ LI ERDÊ TALYANA DIKIN

Girava Pantelariyayê bi bombardîmanên Hevalbenda bêhal ke tiye û xwe avêtîye bextê Hevalbenda. Hevalbenda piştî ko kîşewerê Talyanî bi timamî zêft kiriyê nihû pê li erdê talyana dikin; Pantelariya hatiye vegirtin.

## ENIYA DIWEMIN BI BOMBARDIMANÊN XURT DESTPÊ KIRIYE

Cezayîr — Refên brîtanî û amerîkanî ên mezin, ji bombeavêjên giran hevedudanî dirêjî erdê talyana kirine û li Sêrdînye, Sicîlye, Mesîne, Regîyo. Pantelariya û San Giovaniyê xistine; bombe li dok, depoxane, avahiyên eskerî û li kar û barên wan bajar û benderan ketine û xesarîne dijwar gihandine hejagehên Mihwerê. Refêna Hevalbenda ji hêla jêrîn ve 97 balafrînan neyar avêtîne erdê û xesar gihandîne zehf mekîneyên dijîmin ên din.

Cezayîr — General Katrû şevdî di Cezayîrê de peyiviye û gotiye: Tiştê ko çêbûye ne yekîtiya du koma ye, lê belê yekîtiya Frensî bi tevayî. Frensî jî nû ve dê vegere mezinahiya xwe a berê.

Hêvî û niyazîne teze, dilê welatparêza xurt kiriyê. Dînyayê jî nû ve bawerîya xwe bi qudreta Frensî anîye. Di bin siha alekê de heta dema serfîtazîyê emê şerê dijîmina bikin. Her bijî frensê.

## Bombeavêjên Qerargeha Maltayê Bi Şev û Ro Li hejagehên Talyana Dixin

La Valet — R: Bi awakî resmî elam didin: Neçîrvanên brîtanî ên bombeavêjî di nîro - rohelatê Sicîlyayê de - erdê talyana - dirêjî qerargeha Pazaloyê kirine û lîxistîne; bombe xurt û rast li avahiyên eskerî ketine. Refên brîtanî ên din di nîzîkî Kamîsoyê de rê û pîrên dijîmina û der Kap Stîleyê hejagehên neyarên ên din dane ber bomban. Di girava Maltayê de îşareta talukê hatiye dayîn lê tu tişt ne qewimîye.

Moskû — R: Çekê rûsî ê hewayî balafrîgeha elemana a Brîanskê bombardîman kiriyê.

Wajîngton — General Marşal, serekê şerdariya amerîkanî, vegeriya Wajîngtonê.

Londre — R: Sefîrê Emerîkayê Mr. Wînan û yê Sovyetîstanê M. Maîskî bi hafa Mr. Îdîin ketine, wezîrê Brîtanîya - Mezin ê dervêkariya.

Moskû — Serfermandariya Sovyetî dîde zanîna ko di nav sê mehên dawîn de çekê rûsî 5000 balafrînan dijîmin avêtîne erdê.

Ev xesarên mezin piştî çekê elemanî ê hewayî şkenandîye û jî ber vî yekê eleman planên xwe ên êrîşan edilandîne.

Bi şev û bi ro di ser eniyên şerdî re, qomandîne hewayî dom dikin û girtin û berdan destê refên sovyetî de ye.

Hin hikûmetên bêteref bawer dikin ko dewletên demokrat, mîletên îngilîzî û amerîkanî, nijadê Engîl-sekson zora dijîminên xwe bibin jî, piştî vî şerdî wê bikevin jarf û qelsîyê. Ne wîha ye; piştî vî şerdî emê bibin hej xurtir û qewtir û bawerîya me bi qedera mîletê me her di kûrahîya dilê me de ye.

Serekwezîrî di piştî re qala şerdî kiriyê û gotiye: di hemî eniyên şerdî de emê bi xurtî zora xwe bidin neyarên; bi bombardîmanên hewayî, û bi çek û awayên din êrîşî wan bikin.

Mr. Çorçîl li ser vexwendîna Stalîn civanê Wajîngtonê gotiye: em gelek dilteng bûne ko Stalîn nikarî bû bî ko bikeve mijulgehî me.

Wezîrê brîtanî ê yekemîn bi pirsîna qedîrgiran qala Ordîya Sor kiriyê ya ko barê vî şerdî e girantir bi ciwanmêrîtyeke ecêb hilgirtîye. Li ser yekîtiya kîşewerê Frensîzî gotîne Mr. Çorçîl ev in; em tekkîlî şewîrên frensîzî ko pê yekîtiya frensîzî çûye şerdî ne bûne; lê belê

em gelek dilxweş û kamîran in ko General De Gol û General Jîro ev yekîtiyê birine şerdî û pê dilê hemî Hevalbenda xweş kirine û hîmê azadî, serbestî û mezinahiya Frensî danîne.

### Zora Wan Diçe

Li ser pîrsa talûka noqavên dijîmina Serekwezîr gotiye: Ev talûke hero hindiktir dibê. Îro destgehwaporên Hevalbenda li çûna gemîyêke binavbûyî 3 waporên nû çêdîkin. Ji aliyê din, na be ko em bawer bikin ko a demên giran hatiye rakirin, emê hej rastî wextîne dijwar bî, lê tu şik nîne ko divê em piştî wan gavên giran bişkinînin, bî şik emê pê bikarin.

Mr. Çorçîl jê pê ve, bi dilxweşî elam daye ko tevkariya amerîkanî û brîtanî gelek xurt e, ahengdar e û ko qelq û tevdanên eskerî hej zortir û mezinîr bûn, ew tevkarî jî, wê bibe hej mezinîr û îşretîr, û şerdarî û serfermandariyên Hevalbenda hej bêtir hev û du bibî-

## MEZINÊN DINYAYÊ



GENERAL DE GOL

## DÛRIK DÛRIKÊN LI BER TEMBURE E Y Ş Ê

Mala te sergo ye  
Eysê dêranê  
Mêrê te zaro ye  
Eysê dêranê  
Bavê te mûro ye  
Eysê dêranê  
Tiyê te hûro ye  
Eysê dêranê  
Mala te bilind e  
Eysê dêranê  
Jê pê ket mûm û fînd e  
Eysê dêranê  
Tu rehana gund e  
Eysê dêranê  
Mala te li nav mala  
Eysê dêranê  
Mer' çîranê xala  
Eysê dêranê  
Katib bi qurbanê  
Eysê dêranê.

## FATIMÊ

Erê lê Fatimê lê  
Xatûnê xanimê lê  
Yasîtar li vî bêbavê lê  
Keçê mî te navê lê  
Erê lê Fatimê lê  
Fesalê bi kesimê lê  
Xezîmê hakimê lê  
Yasîtar li vî bêbavê lê  
Keçê mî te navê lê

Îşev êvara îne  
Mele dixwîne yasîne  
Fatimê kar û barê xwe kir  
Kil û mirêka tîne  
Çavê reş e kil didê  
Berê xwe da Mêrdînê  
Hêdî, hêdî xwe dihejîne  
Ba her bîska dixîne

Kilê çava diweşîne  
Dilê xorta d'êşîne  
Erê lê Fatimê lê  
Xatûnê xanimê lê  
Gava Fatim meşîya  
Çarî bi dû de kîşîya  
Kil ji çava weşîya  
Dilê xorta êşîya  
Kul ket mala eşîndîya  
Erê lê Fatimê lê  
Xatûnê xanimê lê.

## O Y O Y

Emê henê çekin  
Emê henê di teştê kin  
Oy, oy, oy, oy.  
Emê li bîskê bûkê kin  
Li sinbêlê zavê kin  
Oy, oy, oy, oy.  
Zavê çû ye sûkê  
T'ant hena bûkê  
Oy, oy, oy, oy.  
Zavê çû hemamê  
Dixwîne Qurânê  
Ji bona îmanê

# DEMA NIHA

## Roja Miletên Hevalbend

Iro cejna Miletên Hevalbend e, yên ko ji bona heq û serbestiya cihanê şerî zalim û zorkera dikin. Di hemî erdên Hevalbendan de şahînetine mezin hatine çekirin û General De Gol û General Jiro di radyoa Cezayirê de peyivîne û bi gotarine heja qedrê wê rejê girtine. Dilê hemî milletên ko heqê wan hatine skênandin, û dilê Kurdan bi Hevalbenda re girêdayî ne û zefê û serfrazîya wan daxwaza dilê me a girimtir e.

Senti-yago de Şilt — Wezaretê Şîlyê istifa xwe daye; Wezareteke nû hatiye danîn.

Mikoşi — Mr. Kazi wezîrê britanî li welatên rohelatê navîn û xanima wî, piştî ko çend roja li Qibrîsê mane, jê vegeryane û hatine Misrê.

Waşington — Serek Benes boriya ko ji Emerfkayê rabe çûye cem Serekcimhûr Mr. Rûzwelt û jê xatir xwestiye.

Moskû — Sed balafirên elemanî dirêjî bajarê Gorkî kirine, 12 bombeavêjên elemanî hatine xistin erdê.

Nûçeyên Dawîn: Lampedusa ketiye. Çekê rûsî 648 balafirên elemnî xistine erdê.

### DI WELATÊ ZEMBEQÊ GEWIR DE

Nivîsevan

Grigori Petrof

Wergêrandok:

Qedrî Can



Ji civîna hezar tîrêjên rojê nuqtake ronî diçirise: ev nuqtaya bi heraretê xwe, tiştên mîna kaxed, ka û êzîngan dişiwitine..... Kevir, cam û hesinê germ dike.

Her mîrxasê mîletekî jî mîna edesekê ye, ew, di şexsê xwe de, quwet û weziyetên mîlet dicivîne û bi wan quwetan gîyanê xelkeki bi milyonan vêdixe... Lê heke hewa bi ewr be, ji tîrêjên rojê bê par be, wê gavê tu edese nikare hebek berf bihelîne û nikare dilopek av germ bike...

Penîrê Iswîçrê, tenê ji çêlekên serê çîyan tê girtin û tê çekirin... Merivên ku ji nav zeman û mîletên muxtelîf derketine jî wisa ne. Ev, mîna bihna çêkekên mîletên nuh bişkivîne, xweş e...

Napolyon, ne ji Çîna Kevn a sulpherwer, lê ji nav Frensa derketiye... İngiltere, Darwîn xwedî kiriye. Wî jî bi navê «Şerê jîyîne» nezeryak berpêş kiriye. Rûsya jî Tolstoy anîye meydanê.

Ev, di her zemanî de, di her cihî de wisan e; yê kû Almanya kir şerê mezin, ne Wilhelmê divim bû... Lê ruhê Almanyanê xasîb û cengawer bûye; îfadeya Wilhelm, Bismarq û Hindenborzan. Nêron û Karaglan Roma kevn xerab ne kirin...

Her mîlet merivê bikêr tîne ser makîna îdareya xwe; gava yek ji wan tê ser kar, didin dî hal û sewiya mîlet a manewî. Di mîlet de tişteki civandî yê heja heye, tune? Yan tê civandin? Heqê mîlet, wîcdanê mîlet bilind dibe, nabe? Yan dirize jehirdayî dibê? Bi jîyîneke kêûn û sefil heba dibe, diçê??

Di vir de, karakterê her yekî jî me, awayê xebata her yekî jî me tê gotin. Em, di nav welatê xwe de, çi dikin? Di ser encama mîletê xwe de çi rol (wezîfe) e distînin?

Li deryayê jêrîn çend giravên mîrcanan hene... Mîrcan ji kîlê çêdibe. Tebaki biçûk, bi navê popîp, jî hundirê xwe. tişteki fîraz dike... Kes bîr nabe ka jî wê fîrazatê, bi zeman ve, giravek çêdibe. Heta li ser van giravan însan jî bi cî û war dibe. Wefk dîn, dîsa li welatê jêrîn mîrcanê biçûk pêja dibin ku ev mîrcî, jî bo însanê

wî welatî afetek e. Malên wêderê teva hûrînrê wan giştî dixwin... û însan mecbûr dibin ko ji ber wan hîcret bikin...

Vêcar em bêne ser hal û ewalê welatê xwe; Xebata me ya di nav welatê de çi ye? Berê wê xebatê li xerabkirinê ye, ya li avakirinê?

Em, karin welatekî biçûk û feqr nîşan bidin ku refah û bextiyariya welat, şerê û rûmeta mîleta bi vîna xelkê wê ve girêdaye... Ew welat xwediyê du milyon serî (nîfûs) Finlanda ye...

Finlanda li bakurê Ewropayê ye. Îqlîmê wê hişk e. Pir caran, bi mij û dûman e. Di buharê de, av û axa wê qeşa digire. Ji tebxê serma destpê dike. Zêmnê wê jî bêkêr e; pir cî hene ku bi zinarên granîttî hatiye girtin. Di nav welatê de bi navê maden tişteki nîne; Cot û çandîni pîr bi diwarî çêdibe. Xelkê wê jî tu caran bi temamî ser xwe bûn (istiqlal) ne dîtîye. Her car hinekan, li ser wan, hukum kirine. Mîletê fin jî xwe re «Suom» dibejin... Ji welatê xweyê nazenîn re jî «Suomi» yanî çîrav...

## ÇAPA KURDI

KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

Kovar û rojnameyên 'kurdî yê ko iro belav dibin ev in:

Reya-Teze: Li heftê sê caran û li bajarê Rewanê belav dibe; rojnameya kurdên Sovyetistanê ye. Bi zar û bi tîpên kurdmançî tîte nivîsandin.

Jîyan: Kovareke edebî û îlmî ye; li serê her heftê carekê û li Sileymaniyê bi der têt. Bi zarê soranî tîte nivîsandin.

Gelawêj: Kovareke edebî û îlmî ye. Li serê her mehê carekê li Bexdayê derdikeve. Zarê wê soranî ye. Kovara Kurdî a mezintir û tekûztir e.

Hawar: Kovareke edebî ye. Ji sala 1933-an ve li Şamê û bi zarê kurdmançî tîte belav kirin.

Ronahtî: Ev du sal in, li Şamê dest bi derketinê kiriye. Zarê wê kurdmançî ye. Ronahtî kovareke misewer e û li serê mehê carekê derdikeve.

# MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER U ASIYIYE


## QIWETÊN KIŞWERÊ



SIWARÊN KIŞWERÊ FRENSIZÎ YÊN KO BI NAVÊ SIPAHÎ DENG DANE



STOLA BRITANÎ BI TEVKARIYA STOLÊN HEVALBENDA HIKMÎ DERYAYÊN CIHANÊ DIKIN.



## ŞERÊ MEZIN YÊ 1914-1918 AN

de Gava tanga pêşîn hatiye çekirin û esker ketine hindurê wê, nikarî bûn tê de bisekinin, motorê ew dikir perçeke agir. Lê mihendiz û hoste dev jê bernedane, ne gatinê bi kîr naye, xebîtîne û iro tang gihaye dereca xwe ya çakiyê a iro. Dinya welê ye; pîr tist hene zehmet in û gava mirovên sist li wan tiştî dinêrin, dibêjin naçe serî; kalikên me gotine: Xebat şer e, dest avêtê dibe rovî.

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet  
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE  
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement  
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE  
DE LA GUERRE

Le vendredi 11 Juin à 11h. 30 du matin les Alliés ont occupé l'île de Pantellaria. La garnison soumise à un bombardement d'enfer de la part des avions et des unités de surface de la flotte avait repoussé un ultimatum; elle a tenu juste assez longtemps pour que sa reddition ne coïncidât pas avec le troisième anniversaire de l'entrée en guerre de l'Italie, le 10 Juin. Quel bilan tragique que celui de ces trois ans de guerre qui ont coûté à l'Italie son prestige, son honneur et son empire... Maintenant les 120 premiers kilomètres carrés de la métropole sont 'conquis; la flotte italienne est coupée en deux et ne peut nulle part trouver un abri efficace; les bombardiers américains sont allés l'attaquer à la Spezzia où 3 des plus récents cuirassés italiens sont ancrés. Elle est loin l'époque où les dirigeants fascistes parlaient de la maîtrise de la «Mare Nostrum». La nouvelle de la chute de Pantellaria va avoir un gros effet sur le moral du peuple italien à qui le Président Roosevelt vient d'adresser un dernier avertissement.

Sur le front Atlantique la guerre sous-marine tourne nettement à l'avantage des Alliés qui détruisent les sous-marins au rythme d'un tous les jours. L'aviation basée en Angleterre après 15 jours de répit a repris ses attaques et 200 bombardiers américains sont allés bombarder de jour Wilhelmshaven et Cuxhaven. En Russie si les opérations terrestres sont limitées, l'activité aérienne est très vive chacun des adversaires essayant de paralyser les communications et les bases de départ de l'autre à la veille des grandes offensives. 700 bombardiers soviétiques ont attaqué les aérodromes allemands.

En Extrême Orient les Alliés bombardent les bases nipponnes tandis que la contre-offensive chinoise du Yang-Tsé continue.

En Europe la presse anglaise et américaine comme les déclarations du Colonel Knox laissent entendre qu'une attaque de grande envergure pourrait se produire bientôt. Les Nazis qui sentent le danger se laisseront-ils aller à des actes désespérés? Ils ont été en tout cas avertis solennellement par Monsieur Roosevelt à propos de l'utilisation des gaz et par Monsieur Eden à propos des otages.

B.

FRONT AERIEN D'EUROPE: — Dans la nuit de Vendredi à Samedi: plus de 1000 bombardiers britanniques déversèrent plus de 2500 tonnes de bombes sur le centre industriel de Dusseldorf et sur la ville de Munster, où hier encore les incendies continuaient à faire rage.

## LES DEPECHEES de la NUIT

FRANCE: — Le Général de GAULLE et le Général GIRAUD ont prononcés une courte allocution à l'occasion de la Fête des Nations Unies.

RUSSIE: — Gomel, Briansk et Karachev, ont été bombardés par l'aviation soviétique. Berlin signale de violents combats dans plusieurs secteurs du front.

EUROPE: — Bochum, Brème et Kiel en Allemagne ainsi que divers objectifs à Flessingue en Hollande et à Lille, dans le nord de la France sont martelés par la R. A. F. et par les bombardiers américains.

MEDITERRANEE: — Les bases aériennes de Sicile sont pilonnées par l'aviation alliés.

CHINE: — Les troupes du Maréchal Tchang Kai Chek poursuivent les forces japonaises en déroute.

Samedi des escadrilles de la R. A. F. attaquaient divers objectifs ennemis à Rouen, Caen et Abbeville.

Dans la nuit de Samedi à Dimanche le centre industriel de Bochum, dans la Ruhr était écrasé sous les bombes de la R. A. F., et dans la journée de dimanche ce sont les bases navales allemandes de Brème et de Kiel.

## LE DECLIN

Rien n'est aussi passionnant à écouter qu'une grande manifestation retransmise par radio. On entend chants et acclamations, bruits et silence des foules, et jusqu'aux moindres intonations des orateurs. Les Allemands sont passés maîtres de ce genre de cérémonies: celles du «Sportpalast» ont leurs apôtres, leur rituel et leur climat. Mais la dernière, celle qui s'est tenue le 5 Juin, a apporté des éléments nouveaux.

Si les nazis ont organisé une manifestation le 5 Juin, ce ne fut certes pas pour célébrer: au contraire. Tour à tour, le Ministre des Armements, Speer, et le Ministre de la Propagande, Goebbels, sont montés à la tribune pour parler sur cet étrange ton, mélange de morgue, d'assurance et de fanatisme que tout bon orateur nazi affecte en public. Mais les arguments qu'ils ont apportés, l'un et l'autre, étaient singulièrement peu encourageants.

Speer a surtout souligné que l'industrie des ersatz a fait de grands progrès dans le Reich: non seulement le Reich est parvenu à changer sensiblement la formule de sa production métallurgique, en réduisant progressivement le pourcentage de cuivre, d'aluminium et d'acier; non seulement toute économie de charbon est acclamée comme une victoire; mais la pénurie d'essence a forcé l'Allemagne à remplacer la fabrication des moteurs à combustibles par celle des générateurs.

Cela n'empêche pas Speer d'affirmer sans sourcilier: «Pour les chars, nous sommes en train de réduire l'avance dont bénéficiait l'ennemi, et nous arriverons même à dépasser sa production», affirmation qui ne manque pas d'étonner qui sait que l'Amérique sort actuellement une moyenne de 3000 chars par mois.

Quant à Goebbels, tout son discours tient dans cette phrase révélatrice: «Nous tiendrons jusqu'au moment où l'adversaire s'écroulera: voilà la base de notre stratégie.»

Ce credo de stratégie défensive est plaisant dans la bouche du petit Docteur. Mais lequel des deux adversaires présente donc des signes d'écroulement? Les Nations-Unies dont les chiffres de production montent et qui viennent de remporter coup sur coup, les victoires de Stalingrad et de Tunisgrad? Ou le Reich dont les difficultés s'accroissent dans tous les domaines?

Sa production est handicapée par le manque de matières premières: Speer ne le cache pas. Elle vient d'être amputée d'une bonne partie de ses ouvriers spécialisés: Goebbels s'en vante: «Nous avons pu libérer plusieurs centaines de

milliers d'ouvriers des usines pour les envoyer sur le front. Ceux qui restent fourniront un rendement d'autant faible que la ration de viande vient d'être diminuée de 100 grammes par semaine; or, pour citer Goebbels: «Nous avons dû augmenter la ration de viande en automne 1942 pour augmenter le rendement des ouvriers.» Cette ration enlevée, les ouvriers ressentiront plus durement encore les conditions pénibles de leur travail: «Nos ouvriers savent par expérience», concède le petit Docteur, «que la vie consiste en fatigues et en soucis.»

Le principal de ces soucis est évidemment la crainte constante des bombardements. Des régions particulièrement éprouvées, Goebbels brosse ce sombre tableau: «L'Allemand moyen ne peut même pas se faire une idée approximative de ce que subissent ses compatriotes dans les régions bombardées et des conditions de leur existence. Des familles entières perdent tous leurs biens au cours d'une nuit; père, mère, enfants, sont emportés.»

La gravité de la situation ressort de cette phrase rageuse: «Les Anglo-Saxons n'ont jamais senti la guerre de près. Voilà pourquoi leur humeur est différente de celle de l'Allemagne». Mais si le Ministre de la Propagande a oublié l'époque où les Anglais subissaient les horreurs de la guerre aérienne, le monde ne suivra pas son exemple. A cette époque, 400 bombardiers allemands partaient pour décharger leurs projectiles sur Coventry. Actuellement, mille bombardiers alliés s'attaquent aux régions industrielles du Reich et de l'Italie.

Mais si «l'humeur des Alliés est différente de celle de l'Allemagne», l'explication n'en est pas seulement dans l'opposition de ces deux chiffres. C'est qu'en aviation comme partout ailleurs, l'étoile de l'Allemagne est sur son déclin. L'époque des faciles victoires est suivie de celle où l'on n'espère plus qu'une seule chose: tenir. Et nombreux doivent être les Allemands qui ne vont même pas jusque-là.

En effet, Goebbels menace des pires châtiments ceux qui «doutent de la victoire, qui écoutent les paroles de l'ennemi, ces traîtres qui affaiblissent l'effort allemand et qui commettent un crime contre le sacrifice de notre peuple: des centaines de milliers de ces fils.»

Goebbels ferait mieux peut-être de ne pas rappeler trop fréquemment le nombre des victimes. Les Allemands pourraient être amenés à se demander: Les sacrifices que nous avons faits, où donc nous ont-ils amenés?

LUCIE VIDAL.

## CHANSON KURDE

Le poème que l'on va lire est une complainte, composée entre 1925 et 1930 par une jeune femme dont l'amant avait été fait prisonnier.

O cavalier, cavalier...  
La montagne est trop haute,  
je ne l'aperçois plus.  
Mes mains voudraient cueillir  
des bouquets de roses, de basilics,  
de narcisses... Elle n'ont pas  
la force d'en rompre les tiges.  
Malheur à moi, malheur à mon père!  
Après avoir connu les yeux de  
Smailé Ayo, ne j'accepterai plus,  
ici-bas l'hommage d'aucun coeur.

O cavalier, cavalier...  
Levée à l'aube, je n'ai rien  
fait encore.  
Mes mains n'ont pas encore touché  
l'eau, froide ou chaude.  
J'ai vu passer les Tziganes,  
je me suis fait dire la bonne aventure,  
Et j'ai appris la triste nouvelle.  
On m'a dit: «Ils ont pris, fillette, le  
noble cher à ton coeur,  
Ils ont mis les menottes aux  
poignets de Smailé Ayo,  
Ils l'ont conduit au poste de  
Diyarbakir.»

O cavalier, cavalier...  
Cavalier, je ne suis plus ici ni  
ailleurs,  
Je suis un lambeau de nuage noir,  
au dessus de la mer,  
Je suis la pluie fine dans le vent,  
Je suis l'amante de Smailé Ayo, père  
d'Avdelqader, cavalier de la pou-  
liche alezane.

O cavalier, cavalier...  
J'entendis que chantait le coq de  
minuit.  
Smailé Ayo, le noble cher à mon  
coeur descendit dans la grande cour,  
harnacha la pouliche grise,  
Se mit en selle, et partit pour les  
pays lointains.  
Je gagnai la terrasse du château  
et l'appelai par trois fois...

O cavalier, cavalier...  
Que brûle notre village maudit-  
la route le long!  
Vint à passer un bataillon de jeunes  
guerriers du Kurdistan.  
Je leur dis «Bon voyage, les gars!  
Où donc allez-vous?  
— Nous allons à la ville de Mouche.  
On s'y bat!» R. LESCOT

### LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:

RIZA TAZE, organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Erivan.

GALAWÉJ, la plus grande revue littéraire kurde, paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire, paraissant à Souleymanie.

JITAN, revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes lorses et français.

HAWAR, revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes lorses et français.

RONAEI, Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

Provisoirement, LE JOUR NOUVEAU paraît une fois par semaine, le Lundi.

# NÊÇÎRVANEKÎ NÛ

Moskû — A.F.I. Radyoa Moskovayê fro elam dida. Gava çavê elemana li nêçîrvanê rûsî ê nû «L - A 5» ketiye zehf tirsiyane û ne xwestine têkîll wî bibin; lê dawî ji bégaviyê pê re dest bi şerî kirias. Cara pêşîn nêçîrvanekî me «L - A 5» 6 Meserşmid xistine erdê. Carekê di 3 Meserşmid dirêjî «L - A 5» kî me kirine; nêçîrvanê me 2 hebên wan anîne xwar, ê sewemîn bax daye; û ev bê ko zerer bigebe nêçîrvanê sovyetî. Balafrvanê rûsî Azarov yê ko siwarî «L - A 5» êkî bû bû, di şerêkî hewayî de 10 mekneyên dijmin xira kirine.

Londre — Rojnamê Ingilzî «Sendey Ekispres» dinivîse: Talyan û eleman nihû ko derbên balafrên Hevalbenda bi xurtî digebîn wan didin ber qira, lê hêrî sê salan gava pêşiya wan de kesekî devê xwe vedekir dirêjî wî dikirin, bi zilm û zorkeriyê ew dimirandin.

Wan dixwest şaristana Londrê a mezin û qedm, bajarê Kenterburyê ê miqedes hilweştin. Gava zilm û zorkerî bi keri wan dihat pê emel kirine û li wê wextê wan nefsa xwe mezin didîta, û xwe serbilind dihesibandin. Heta dawiye emê şerî wan bikin, heta wê wextê ko ewê bêhal bikevin, û bikevin erdê; ko me wilo ne kir, me dilnema kir, ew li insanîyetê bebextiyek e.

## Strana Kurdî

### Emîna

Emîna ban kir Pêrûza  
Go: porê serê te kur be  
Izedîne mala Temo  
Şewir û mişawirên giran datînin  
Koma giran li ser kozikê û  
Çepelê Qenyatê dicivînin  
Tacdîn mala Hecî Osman ne li malê  
Li mîrata Pêpanê, nobetê dikînin  
Pêrûza tu rabe, herê xwe  
Bide mala Melê  
Bê: namûsa namûsa Xwedê û  
Namûsa mêrê çê ye.  
Bila kaxezekê binivîse û bibe Pêpanê  
Di destê Tacdîne mala Hecî  
Osman de deynê...  
Bê: namûsa Xwedê û  
Namûsa mêrê çê ye

Mela radibe, kaxetê dinivîsê û  
Berê xwe daye Pêpanê  
Kaxetê di destê Tacdîne mala Hecî  
Osman de datîne.

Gava kaxetê di destê Tacdîne de  
Deytîne  
Tacdîn li kaxezê dinêre  
Aqilê wî, di serê wî de namîne.  
Ban dike peyan dibê;  
Geli peyano, hon nobetê bixîstînin  
Ji êvara Xwedê de, dengê  
Wan çapliyan  
Li ser kozika Qenyatê xweş te.  
Hon nobetê bixîstînin  
Ezê herim saxlîkî ji kozika  
Qenyatê hiltînim.

Tacdîn radibê û dilezîne  
Hayê wî tu carî ji bayê  
Felekê tu nîne  
Izedîne mala Temo Gewrê  
Şewir û mişawirên giran datîne  
Sê kemîna li pêşiya Tacdîne  
Mala Hecî Osman deytîne.

Tacdîne mala Hecî Osman tê û  
Dilezîne  
Dikeve nav her sê kemînan  
Her sê kemîna lê diteqînin;  
Destê xwe davê ser xencere  
Her sê kemîna bi xencere dikêşîne  
Xwe bi darê xencere dikêşîne  
Kozika jorî, di kozikê de radîne..

Izedîne mala Temo ban dikê dibê;  
—Tacdîno tu a min biki, tu ê rabî  
Ji kozika Qenyatê bixwîne  
Û tu ranebî  
Wa'dê Xwedê li canê min keti be,  
Ezê vê sibehê ruhê te bistînim.  
Tacdîn ban kiriyê, go:  
Izedîne mala Temo,  
Ez kekê Izedîna û Bedredîna im,  
Ez gurekî  
Ji gurên zozana devbixwîna im,  
Ezê heyvanê we ji dinyê biqellînim.

Smallê Mihemed ban dikirî dîgo:  
Xalo! Tacdîno! tu a min biki  
Tu rabî ji kozika Qenyatê,  
Bê xwîna e...

Tacdîn ban dikiriyê dîgo:  
—Smallê Mihemed  
Bi Şexê Mihemed Kerbasî...  
Bi kekîka Bagasî...  
Heke devê te dibêjî, dilê te na bêjî!  
Heke tu xwarziyê min f,  
Ez Tacdîn im  
Ez gurê zozana devbixwîna im,  
Ezê car di bikim kerxa mêra  
Û xwîna e.  
Îcar dinya misilmanî ye  
Heke tu xwarziyê min f  
Û ez xalê te me  
Tu rabî xwe berdî, Qirqata jêrin  
Cem Hecî Bedredîne  
Belkî koma giran  
Li ser xalê te vegeîrîne...


Heft eşîr  
Koma Rîma û a Kosa û  
A Hebizbîniya û a Omeriya  
Timam li ser kozikê civiyan.  
Eliyê Hezarî ban dikirî dîgo:  
Xalo Tacdîno, ezê pîresekê  
Ji te re bêjim  
Ko: tu bê, ji tîrsa ye, ez na bêjim...  
Heft eşîr, hatine ser me  
Emê rabîna, emê herîna...  
Tacdîn ban kiriyê, go: Elî lawol  
Me heya niha, min dîgo:  
Qey tu mérékî baş f...  
Belê navê mêraniyê  
Di nav te de nîne.  
Wa'dê li min keti be  
Ez navê revê  
Bi dû mala Hesen Şemdîna na xînim.  
Tacdîn go: Elî lawol!  
Tu rabe, durbîne  
Li ber çavê xwe deynê...  
Li deşta Kerbasê bimeyîzîne  
Bîrek peya ji deşta Kerbasê  
Têna û dilezîna...  
Ez ni zanim ne dost, ne dijmin in...

Gava ko wilo jê re got;  
Mihemedê Hecî Ebdela got;  
Lo... Lo...! Tacdîno  
Wa'dê Xwedê li min keti be  
Heke Xwedê ruhê te ne stîne  
Ezê fro ruhê te bistînim.  
Tacdîn ban dikiriyê dîgo:  
Mihemedê Hecî Ebdela  
Ne hewceyê zirta û forta yel...  
Nayê bîra te roja ko tu li  
Deşta Kerbasîyan bû, û ez û tu  
Li hev rast hatin, tu bi sî peyê ve û  
Ez bitenê bûm û min berda dû te  
Û min deh zelamên te kuştin  
Û min tu heya nav malê Kerbasîya  
birin. Fro hon heft eşîr in û ez bi-  
tenê me, piraniyê mêranî daniye;  
Belê ezê çî bikim...

Eşîr lê hatine hevdu û hema tîfîngên  
xwe lê rast kirin; derbek lê-  
xistin; hina ruhê te hebû; ban kir-  
—xwarziyê xwe Eliyê Hezarî—go:  
—Lawo rahişt tîfînga min, xeyra  
min ne maye, wê te ji bikujin,  
Elî rabû û di ko xeyra wî ne maye,  
xwe di kozikê re avêt nav peyan,  
peya ji ber bûn du ail, go qey  
Tacdîn e.  
Tîfînga wî xelas kir û ew ji xelas  
bû. Tacdîn tu xweş xelas bû.

# PÊJINÊN DINYAYÊ


## WAPOREKE BALAFIRHILGIR



SERBANÊ WAPORÊ DEWSA FIRÎNÊ YE



MOTORA VÊ BALAFIRÊ 2.000 HESP XURT E,  
û Di Saetkê De 640 Kilomêre Difere



DUGLAS SBD - 3

Motora wê 1.200 Hesp Xurt e. 500 Kilo Bombe Hildigire,  
2 Mîtraloyzên wê hene.



MOTORA WÊ 1.065 HESP XURT E;  
Torpileke Mezin, 750 Kilo Giran hildigire.